13

Freud û nexweşiya hîstiryayê

Dr. Ebdulbaqî Mayî

Sigmund Freud li sala 1895-ê li bajêrê Viennayê paytextê Nemsayê wek babê şiroveya derûnî hatiye nasîn.

Piştî li welatê Çîkî ya noke ji dayika xwe bûyî, Freud di rewşeka jarî u destkortîyê da mezin bû, belê wek çirîskeka zîrekatiyê li xwandingehê xwe diyar kir. Ji bo xwandina doxtoriyê li bajêrê Parîs hate wergirtin. Nesaxiya Hysteria ya ku berî wî çarcotî li jinka aşkira kirî Freudî pitir behis kir u li ser nivêsî. Ev nesaxiye wekî modê li ewî wextî di nav jinkên dewlemend u binemalan da belav bi bu.

Freud li bajêrê Vienna klînîkek taybet ji bo evan nesaxên Hystiria vekir. Çareseriya wan bi rêka xewkirinê (Hypnosis) kir.

Hêdî hêdî bo wî aşkira bû mirov di vê nesaxiyê nagehit heta nesax dilê xwe li ser babetên cinsî di wextê nesaxî diyarbûy da dirêj nekit. Gelek lêkolîn li wî demî li ser van nesaxên jin hatin kirin.

Freud wesa diyar kir ku jin ji ber hest bi şermî û gunhê hezên xwe yên cinsî vedişartin û ji bo rehetkirina mêrî, xwe mit dikir.

Demê wan di runiştinên çareserkirina derûnî de li gel Freudî behsa xwe bi azadî dikir û dilê xwe dirêj dikir, Freud wesa diyar kir ku ev jin e ji ber xendiqandin û fetisandina hezên xwe yên cinsî, demê li gel mêrî dinivist, xwe wek tepeser û jêrdest didît.

Gelek ji wan jinan wek qurbanên zordariya cinsî hatin nîşandan lewma nesaxiyên derûnî wek hîstirya lê diyar dibûn.

Freudî li ser van babetan gelek nivêsîn û lêkolîn kirin. Pirtûkên wî wek "Vekirina Xewnan" û "Têsa Cinsî" û "Lêkolînên Nesaxan" li hemî rojavayê belav bûn û xelk li gel Freudî yan dibûn heval yan jî dijmin. Gelek wêrîsyên Psychoanalysis bi dûv Freud ketin, wek Jung, Reich û kiça Freudî Anna. Belê gelek dijimin jî bo Freudî peyda bûn ji ber cesaret û boçûnên wî yên zanistî.

Sala 1938-yê, berî ku Elmanî Viennayê bigirin, Freud li gel xêzana xwe şiya xwe xilas bike û emnahî li bajêrê Londonê dît û her li wêderê salekê piştî hîngê, mir.

Sala 1933-yê Freud di nameyek xwe de dinivêse: "Eger pirtukên min di wextekê berê de hatiban dîtin, xelk da min bisoje, belê evro xelkek raziye hema pirtukên min bi tinê bisojin".

Di welatê me de noke jî hîstirya wek nesaxiyekê di nav xelkî û doxtoran de aşkera ye. Belê kî dizane, çima ev nesaxî bi tinê li cem keçên genc û jinkan mişe ye? Û eger li welatê me evro yek e wek Freudî li ser bingeh û sûcên vê nesaxiyê vekolînan bike, tu bibêjî ku ew bi xwe dê bihê sotin an jî nivêsên wî?!